

“ZÛDA MIRYE”

Yêrêvanêda maleke kurda hebû. Dê-bavê malxuê û kevanîê Romê kuştibûn. Herdu ancax ji zulma Romê xilaz bûbûn û êtîmxanê Ermenîstanêda mezin bûbûn. Hevdu dîtibûn û hev stendibûn. Xwendina malxuêye bilind hebû û îdareke dewletêda kar dikir. Sê zarê wan hebûn: qîzek, du kur. Maleke gelekî dibûrî bû. Tu qûl-benda derê wê malê venedikir, ne jî ew diçûne malê kesekî. Dûrva te tirê maleke gelekî bi tifaqe, xweyê erf-edetê miletîêye. Çimkî wexta gilî dihat ser erf-edetê me, malxuê û kevanya wî usa nîşan didan, wekî ew zef rind wana zanin. Hilbet, eva yeka degme diqewimî, wekî ew herin nava kurda, civatê wan.

Bes bela bû, wekî malxuê wê malê çûye rehmetê. Min û hevalê xwe qirar kir herin serxweşîê bidne kura. Me zor-cefakî mala wî dît. Nîvro bû. Em çûne hundur. Meytê wî tabûtêda danîbûn ser textê orta odê. Tenê jina wî û qîza wî dûr rûniştibûn. Kur ne wêderê bûn. Gava me pirsî, wekî kur kune, gotin “oda mayînda razane”. Jinê û qîzê şîrin-şîrin hevdura xeberdidan. Axîn-ofîna wana nîbû, tu hêsirek ç’evê wan nedihat. Nedihate kivişê, wekî malxuê wê malê mirye.

Ez hevalê xwe hevekî sekinîn, me ç’evê hev nihêrî û min hêdî gotê:

- Em herin, tê kivişê rehmetî teze nemirye, zûda mirye.

Nizanim, dê û qîzê ew gotina min bihîstin yanê na. Tê kivişê bihîstin, lê minra hesab yek bû.

Hevalê min ecêbmayî ji min pirsî:

- Çira dibêjî “zûda mirye”?

- Wekî zûda nemirîbûya, wê bihata kivişê, wekî em çûne mala mirîê teze û şîna giran tê kirinê. Lê nha kur alîkîda ro nava nîvro çûne oda mayînda razane, jin û qîz jî tê bêjî bi sala hevdu nedîtine, şîrin-şîrin hevdura xeber didin. Ez ser wê fikrê nînim, wekî wextê şîne ese gotî jin porê xwe verûn, sûrtê xwe çencerûkin. Şîn jî gotî şîne, lê vêderê me şîn nedît, çimkî belengazî zûda mirye û talaşa kesekî jî nîne.

Û em lez ji wê malê derketin, çûn.